# Benckira gelemperî:

## Metirsî û bandorên alî

Her kesek cûda ye û ne gengaz e ku meriv zanibe kî dê bandorêk alî an talûkeyên bibîne. Mirovên ku pirsgirêkên tendirûstî dijîn an jî hewcedarîya wan bi niştergerî heye bêtir gengaz e ku ew bandor û metirsiyan tecrûbe bikin.



Hejmarên li jêr navgînên lêpirsînê yên lêkolînê ne. Mirovên di lêkolînan de ku bi pirani rûtînek wan a neştergerî hebû, giraniyek wan a tendurist hebû û ti pirsgirêkên wan ên tenduristiyê tune bû.





Hûn dikarin lêkolîna ku me bi kar aniye ji vir peyda bikin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/evidence.

**Dibe ku metirsiyên we ji van hejmaran zêdetir an jî kêmtir be. Bijîşkê we yê bencê dê metirsiyên ku ji bo we îhtîmaltir an girîngtir in bi we re nîqaş bikin.**


Hûn dikarin agahiyên zêdetir derbarê cûreyên benckirinê ser malpera me bi zimanên cuda peyda bikin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

**Ev hejmar ji her 100 kesî hatiye girtin.**

| Çi qewimî? | | Çiqas berdewam kir? | Çend kes? Ji her 100 kesî (sed kes) |
|---|---|---|---|
|  | **Lerizîn** | Li odeya başbûnê bi qasî 20-30 deqeyan |  **15** dît — **85** nedît |
|  | **Levbûn (hestkirin bi nexweşiyê)** | Bi qasî 1-24 seetan |  **Nêzî 15** dît — **Nêzî 85** nedît |
|  | **Kulbûna gewriyê** | Bi qasî 24-48 seetan |  **20-40** dît — **60-80** nedît<br>Giredayî cûrêya lûleya bêhngirtinê ye |
|  | **Gerisandin an êş** ji derzîkirinê. | Di nav çend rojan de diçe |  **10** dît — **90** nedît |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
|  | **Birîna sivik li lêv an ziman** | Di çend rojan de baş dibe |  **1-5** dît | **95-99** nedît |
|  | **Enfeksiyona singê** | Ji bo çend rojan, hefteyek |  **20** dît | **80** nedît |
|  | **Şaşmayîbûn (delirium)** | Ji bo çend rojan an hefteyek an mehan |  **10-50** dît | **50-90** nedît |

**Metirsiyên li jêr kêm in.**
Ev hejmar ji her 10.000 kesî hatiye girtin.

| | Çi qewimî? | Çiqas berdewam kir? | Çend kes? Ji her 10.000 kesan (deh hezar kes) | |
|---|---|---|---|---|
|  | **Zerara diranan** | Pêdivî bi diransazek heye | **5** dît | **9.995** nedît |
|  | **Şêlî dîtin, xurîn an jî êşa çavan** ji ber xêzikên biçûk an çavên ziwa. | Bi çend rojan | **Nêzî 5** dît | **Nêzî 9.995** nedît |
|  | **Bêhestî, tevizandin, êş an lawazî** (zirara temarê). | Demkî (bi hefteyan heta mehan)<br><br>Mayînde | **1-5** dît<br><br>**1** dît | **9.995-9.999** nedît<br><br>**9.999** nedît |
|  | **Berteka giran a alerjîk (anaphylaxis)** | Bi lez diqewime Yekser tê tedawî kirin | **1** dît | **9.999** nedît |
|  | **Rawestana Dil, wek dilê dema neştergeriyê disekine** | Yekser tê tedawî kirin | **3** dît | **9.997** nedît |

Ev hejmar ji her 100 000 kesî hatiye girtin.

| Çi qewimî? | | Çend kes? Ji nav 100.000 kesan (sed hezar kes) | |
|---|---|---|---|
|  | **Ji bo demeke kurt şiyar bûn**<br>dema benckira gelemperî (hişyariya bêhemdî) | **5** bû<br>Ji nav her 100.000 kesî de 3-4 kes gotin ku berî niştergeriyê yan jî piştî niştergeriyê, ji pênc deqeyan kêmtir dom kiriye.<br>Ji nav her 100 000 kesî de 1 kes got ku ew hinek êş hîs kiriye. | **99.995** nebû |
|  | **Çavê xwe ji dest dan (kor bûn)**<br>ji ber zext an meyînên xwînê ku bandor li demara dîtinê dikin. | **1** dît | **99.999** nedît |
|  | **Mirina ji ber pirsgirêkên niştergeriyê** | **14** dît | **99.986** nedît |
| | **Mirina ji ber rawestana dil di dema niştergeriyê yan piştî wê** | **1** dît | **99.999** nedît |
| | **Mirina ji ber benckirê** | **1** dît | **99.999** nedît |
| | Ev metirsî pir cûda dibe. Bo nimûne, ji bo hin niştergeriyan zêdetir e, û heke mirov lawaz be, bitemen be yan xwedan pirsgirêkên tenduristî be, metirsî zêdetirin. | | |

## Destjêkişandin

Em gelek hewl didin da ko agahiya di vê broşûrê de durist û nûjen bimînin, lê em nikarin ji vê yekê herdem piştrastbin. Em pêşbînyê nakin ko ev agahîyên giştîyane wê persivbin ji bo hemû pirsên we, yanjî çareserî be bo hemû tiştên giring li gel te. Pêwîste hûn li gel koma pizişkî guftûgoyê bikin li ser bijarên xwe û metirsiyên xwe, bi alîkariya vê broşûrê wek rêbîr. Divê ev belavok bi serê xwe wekî şîret neyê hesibandin. Nabe ev broşûr bê bikaranîn ji bo mebestek bazirganî yan sûdkarî. Ji bo Bêberpirsiyarî gişî, zehmetnebi biner ([www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji](https://www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji)).

Hemû wergeran ji alîyê civanta wergervanên Wergervanên Bêsînor (Translators Without Borders) tên çêkirin. Lêvegerîn tê kirin li ser başîya van wergeran ta çêbibi, lê her metirsîya şaştîyan û şaştêgihiştinî heye ji van agahîya.

# www.rcoa.ac.uk

[patientinformation@rcoa.ac.uk](mailto:patientinformation@rcoa.ac.uk)

**© 2024 Royal College of Anaesthesists (RCoA)**
Dibe ku ev agahî ji bo çêkirina bûjena agahiya nexweşê were kopîkirin. Ji kerema xwe, çavkanîya resen binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê agahiyê di weşaneke din de bikar bînin, divê destûreke guncav were dayîn û grafîk, marka, wêne û îkon werin rakirin. Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema we bi me re têkilîyê deynin.